**Rêzîkên bêdewamî, îcaze û betlane di bernameyê introyê de**

Ji bo bêdewamî(giyabetê) di bernameya întroyê de bi piranî li gorî qaîdeyên di jiyana xebatê de derbas dibin. Yek îstîsna ev e ku tu nekari bi qismî di îcaze yê nexweşî de bibî. Di derbarê qaîdeyên ji bo betlaneyê, ji bo beşdarên bernameyên introyê yên ku ji qaîdeyên di jiyana xebatê de cuda ne, hukmên cuda hatine veqetandin.

Heger hûn nexweş in, divê hûn di zûtirîn dem de agahdarî bidin şaredarîyê re, mamoste an cîhê ku hûn staj lê dikin ku hûn nayên. Di bûyera bêdewamîyekî reva de, mafê we heye ku hûn meaşê întroyê hildin. Heger hûn bi beyanê xwe bikar neyînin, û hûn nikarin bi raporê tixtorê belge bikin ku hûn nexweşin an destûr ji we re neyê dayîn, hûn ê ji bo demjimêr an rojên ku hûn bêdewamin ji meaşê we werin bibirîn, kêm kirin. Dê wekî bêdewamîyek bê qûsûr were qebûl kirin û an bê belge were hesibandin. Bêdewamîyekî bê sedemê bi belge dibe ku bibe sedem bo mafê beşdarbûna di bernameya întro jî destê te biçe û meaşê introyê nedin te re

**Nexweşî**

Li ser bingeha beyanê xwe an raporê tixtor, dibe ku hûn di bernameya introyê de amade nebin heger nexweşî an birîndariyek we hebe ku ji hatinê we asteng bike. Hûn bi xwe bi beyanê xwe yê agahdariyê bikar tînin û bi nivîskî an devkî bi peyama ku hûn nexweş in bi şaredarî, navenda introyê, berpirsîyarê bernameyê an mamoste re têkilî dayînin.

• Tenê dema ku hûn 8 hefteyan de beşdarî bernameya introyê bibin , ew çaxê mafê we heye ku hûn bi beyanê xwe yê nexweşî dikarin bi kar bînin. Heger hûn nikarin dewamê bernameyê bibin ji ber ku hûn nexweşîn , divê berê 8 hefteyên yekem de bi belgeya tixtorê hildin.

• Derfeta we heye ku hûn di nav 12 mehan de 4 caran beyanê xwe yê nexweşî bikar bînin. Her beyanê xwe yê nexweşî dikare heta 3 rojên nav saleki de bidome.

• Heger hûn ji 3 rojan zêdetir nexweş bin, dive hûn biçin tixtorê û raporê nexweşîyê ya tixtor hildin. heger hûn di nav 12 mehan de piştî ku 4 caran bi beyanê xwe bikar bînin, divê hûn heman tiştê bikin bo nexweş bûn.

Heger yek an du zarokên we hene, hûn dikarin di 12 mehan de heya 10 rojanli mal cem zarok bimînîn gava zarok nexweş e.

Heger we ji du zarokan zêdetir zarok hebin, hûn dikarin di 12 mehan de heya 15 rojanli mal cem zarok bimînîn gava zarok nexweş e.

Heger hûn bi tenê li zarokan miqate dibin û yek an du zarokên we hebin 20 roj û heger ji dû zêdetir zarokên we hene 30 rojî mafê we heye bo ku li mal cem zarokê li demê newxeşî de bimînîn. Heger zarokek we bi nexweşiyekî kronîk yan seqet heye û ev îhtîmalek mezîn be bo bêdewamî bo bernameya întroyê yê we de , di 12 mehên dawî de mafê we heye ku heya 20 rojan neçin.Heger hûn di berpirsîyatîyê lênihêrînê de tenê bin, ev wextê 40 rojan we heq heye neçin bernameyê introyê.

Beşdarêkî dêûbav bi tenê tê hesibandin heger dêûbavê din yê zaroke ji bo demeke dirêj nikaribe çavdêriya zarokê bike ji ber sedemê seqetbûnek wî/wê heye an ji li saziyek tenduristiyê hatî be razandin an wekî din.
Heger kesê ku lênihêrînêrê zarok be û nexweş be her ev rêzik bi kar tên. Heger bê berdewam bûn ji 3 rojan dirêjtir be, dibe ku belediye ji we bixwaze ku hûn bi raporê bijîşk/tixtor nexweşiyê zarok an nexweşîyê kesên ku lênihêrînê zarok belge bikin.

**Destûr ji bernameya întroyê**

Destûr bi sedemê ducaniyê de
Heger hûn ducanî ne, mafê we heye ku hûn meaşê bernameya introyê ya bê qut kirinê hildin bi têkildarî kontrola ducaniyê bibin, dema ku muayeneyên bi vî rengî bi maqûlî li derveyî dema bernameyê pêk neyên. Di dema ducaniyê de, mafê we heye ku hûn ji deh rojan beşdarî bernameyê întroyê yê bi meaş bibin.
**Şîrdanê**
Heke hûn zarokê / a xwe şîr didin, hûn ê di sala yekem a jiyanê ya zarok de mafê mûçeya danasînê heya yek demjimêrê bimînin ku her roj şîrê xwe bidin.

**Di dema zayîn û zîrkur/zirke keç anîn de desturê ji bernameyê intro**
Piştî zayînê, dêûbavên ku beşdarî bernameya intro dibin mafê wan heye ku di sala yekem a jiyana zarok de heya deh mehan bi tevahî destûra bo lênêrînê zarok bigirin. Heger hûn piştî ji dayikbûnê an zirkur anîn de li îcazeyê bo lênêrînê zarok bin, şaredarî dê perwerdehiya ziman û temrînê zimanê Norwêjî pêşkêşî we bike. Pêşniyara ji şaredariyê divê ji meha çaremîn a dema destûrê ve were dayîn û li gorî we jî were guhertin.
Di rewşa zirkur/zir keç hildan de, , heger zarok di bin 15 salî de be, dêûbavên xwedê kirinê zarok yên ku beşdarî bernameya introyê dibin, mafê wan heye ku bi tevahî heya deh mehan destûra lênêrînê wergrin.
Li ku her du dêûbav beşdarî bernameyek danasînê bibin, 75 rojên destûra lênihêrînê ji bo bav û 75 roj jî ji bo dayikê têne veqetandin. Ger bav rojên betlaneyê bikar neyne, ew dice, sifir dibe. Heke bav bi tevahî girêdayî alîkariyê be ku lênihêrîna zarok ji ber nexweşiyê an birîndariyê ve girêbide an jî li saziyek tenduristiyê were qebûl kirin dibe ku ji vê bendê veqetandin bêne kirin. Divê ev bi daxuyaniya bijîşkek were belge kirin.

**Destûr**
Hûn dikarin ji şaredariyê destûr bixwazin ka hûn dikarin destûrê civakî hildin heger hûn biçin ba pijîşk an diranan, ji bo hevpeyivînek kar an tiştek din. Her weha hûn dikarin gava ku zarok dest bi dibistanê an baxçeyê zarokan dikin, di bûyera mirinê ji malbatê yan yekî nêz, hwd destûr hildin bi daxwazî kirinê destûrê civakî. Di derbarê vê yekê de bêtir agahdarî ji şêwirmendê bernameya we têne girtin.
Li ser bingeha raporê bijîşkê( tixtorê) mafê we heye ku hûn ji bernameya întroyê daxwazîyê destûrê bikin heger hûn an zarokê we demek dirêj nexweş be. Wê demê hûn dikarin heya

salekê bê meaş destûrê hildin.

**Betlane û tehtilên giştî**

Divê her kes rojên şemî û yekşemê ji bernameya introyê azad, serbest be.
Rojên jêrîn li Norwêc betlaneyên giştî ne û wê demê divê beşdaran (hûn) neçin dibistanê yanî bo we tehtîl e : 1-em û 17-ê Gulanê, 1-emîn rojê yê sersal, pêncşema pîroz, înê dirêj(pîroz), Roja cejna hêkan an Paskalya, Roja seferê Îsa bo ezmanê, pencî roj piştî seferê ezmanê ,1-emîn û 2-emîn rojê dayik bûnê Mesîx û 2-emînê pencî emînê seferê ezmanê Isa.
Heger bot e rojê din ye cejn yan ji rojê piroz heben k utu dixwazî ji bernameyê întroyê îcaze hildi bo piroz kirinê wê jejnê xwe, mafê te heye heya 2 roja bo destûr û perê te jî nabirin.Lê dive tu ew şaredarî re ji berê de bejî bo ku bizanin.

**Betlane**

Her sal 25 roj mafê te heye bo tehtîlê.Şaredarî bi xwe biryar dide ka kengê tehtîlê destpê bike.
Mafê te heye bo meaşê introyê heger tu tehtîlê de bi